Utlendingsdirektoratet
Norwegian Directorate
of Immigration

# Forma razîbûnê ji bo radestkirina agahiyên kesane ji bo xizmetên tenduristiyê yên şaredariyê

## 1. Armanc

Bi îmzekirina vê formê, ez razî me ku kempa penaberan ku ez lê dimînim bikaribe agahiyên kesane yên min yên ku di xala 2-an de hatine destnîşan kirin bi şaredariya (belediya)

________________________________________

re parve bike, da ku kempa penaberan bikaribe alîkariya min bike ji bo veqetandina mew'idan bi xizmetên tenduristiyê (saxiyê/sihhî) re.

## 2. Kîjan agahiyên kesane dê ji bo şaredariyê bêne dayîn?

Ez razî me ku ev agahiyên kesane bi şaredariya mêvandar re bêne parvekirin:

- Nav û paşnav
- Cins (jin/mêr)
- Hejmara D
- Hejmara telefonê
- Navnîşana e-postê

Ez dizanim ku ez xwe jî dikarim rasterast bi şaredariyê re têkiliyê daynim ji bo wergirtina alîkariya tenduristiyê. Ez jî dizanim ku razîbûna min ji bo ku kempa penaberan agahiyên kesane yên min bi şaredariyê re parve bike bi dilxwazî ye, û ez dizanim ku eger ez razî ne bim jî, dîsa jî mafê min heye alîkariya tenduristî (sihhî) wergrim.

## 3. Derbarê razîbûnê de

Razîbûn bi dilxwazî ye û heta ku ez li kempa penaberan dimînim derbasdar e. Ez dikarim her dem razîbûna xwe paşve bigrim bi riya agadarkirina kempa penaberan.

Dema ku ez ji kempa penaberan derkevim, razîbûn êdî ne derbasdar e, û form û hemû agahiyên kesane dê bi lez û bez ji aliyê kempê ve bêne jêbirin.

## 4. Mafên min

Mafê min heye ku ez agahiyên kesane yên ku di vê forma razîbûnê de hatine tomarkirin bibînim, wan rast bikim û wan jê bibim, bi şertê ku ez bi kempa penaberan re têkiliyê daynim.

Li gorî qanûna arşîvê Şaredarî mecbûr e ku arşîvê bigire. Ev tê wateya ku agahiyên kesane yên ku bi şaredariyê re tên parvekirin dikarin wekî agahiyên hêjayî arşîvkirinê bêne nirxandin û divê bêne parastin, û ew nikarin bêne jêbirin, her çende tu paşê razîbûna xwe paşve bigirî jî.

## 5. Piştrastkirina razîbûnê

Bi vê re ez piştrast dikim ku min şertên vê razîbûnê baş fam kirine û ez razî me ku kempa penaberan agahiyên kesane yên min bi şaredariyê re parve bike, bi awayê ku li jor hatiye danasîn.

Cih ____________________ Tarîx __________

Îmze ____________________